



CANKURD

Avakirina encumena siyasî ya kurdî

Li rojavayê Kurdistanê

Gaveke hêja ye

1/4/2010

Gelek ji zû ve, gelê me gilî û gazincên xwe ji tevgera me ya siyasî dike, û herdem axaza berhevhatin û yekbûnê dike, ji ber ku bav û bavpîran, mezin û pêşseran, tevan digotin, ku bê yekbûn hêza me pêda nabe, û tenê bi yekîti û hevreyî emê bigihin war û armancan.

Bi hatina serê sala me ya nû re, nûçeya avakirina “*Meclîsa siyasî ya kurdî li Sûriyê*” ji aliyê tevgera me ya giranbiha ve hate belavkirin, û me yekser, bê dudilî, ew bi gotarekê di wê şevê de pîroz kir, tevî ku gelek rexneyên me li karê tevgerê hene, û bi teybet li hinek kesayetiyên wê û li hinek şêweyên xebatê.

Tevî ku ne heme partiyên kurdî yên sûrî di nav vê danişgehê “*Meclîs*” de cîhên xwe digirin, hema bi rast, ev baştirîn nûçe bû bi barkirina sala çûyî re, diyariyeke pir mezin û giranbiha bû ji aliyê tevgera me ya siyasî ve, bo gelê Kurd ê çavrêyê gaveke wilo hêja fikir, û berê pir xebat di vî warê hatin kirin, lê bi ser neketibûn.

Dayîkên ku lawên wan di leşkeriyê de, ji aliyê berpîrsên wan ve hatîne şehîdkirin, wê bêguman bi vê nûçeyê dilşad bibin... Ta niha 34 ciwanên kurd bi terzekî xiniz di leşkergehên sûrî de ji sala 2004 ve hatîne kuştin.

Ev nûçeya hêja, wê dilên gelek ciwan û xebatkarên me yên demokrat di zindanan sûrî de şa bike. Ji wan jî roşenbîr û pêşmêrên siyasî, wekî hêja Hesên Salêh, Mustefa Cumme, Mihemmed Salêh, Maşaal Temo, Pîr Rustem, Mustefa Ismaîl, Mihemmed Mustefa, Maarûf Mele Ahmed, Anwer Naso, û gelek hêjayên dî, ku bergeh bo hejmartina wan tevan di vir de nîne...

Ji aliyekî dî ve, heme hêzên dost li derve, û li hindirê Sûriyê, bo partiyên kurdî digotin, ku ewana ne amade ne bi evqas hejmar partiyên re bidin û bistînin, û ji Kurdan têye xwestin, ku di nav xwe de zimanwerekî hevreyî pêda bikin. Di civîneke taybet de li Washingtonê, ku di navbera hinek berpîrsên bilind ên amerîkî û hinek Kurdan de, berî niha bi demeke kurt çêbû bû, ev axaz dîsa ji Kurdan hatibû

kirin. Hinek mezinên hembervaniya demokratî li Sûriyê jî herdem dibêjin:”Em nizanin bi kê re têkiliyê li dar xînin.”

9 partiyên piçûk û mezin di nav vê danîşgehê de ciyên xwe digirin, giş demokratî û bi aştiane xebat û kefteleftên xwe yê neteweyî dikin, axazên wan dikevîne berdestiya gelê Kurd û ji teviya gelên sûrî re demokratîyê, azadiyê û paristina mafên mirov dixwazin.

Ta niha du partiyên ku di siyaseta xwe de li hember zorbazîya sîstema Baasê deselatdar herdem gevş û nerm mane, tew ne amadene bo xebateke derveyî “Xêzên Sor” ên sîstemê, nektine nav vê danîşgehê. Ewana jî dixebitîn danîşgehê ava bikin, lê Xwedê dizane, tenê wekî bernameyên xwe dixwastin wê ava bikin, û lew re di bizava xwe de bi ser neketin. Yek Partiya Demokratî ya Kurdî ya Pêşverû ye, ku serekê wê ji bêtirê 40 salan ve pîremêrê navgiran Mamhoste Evdilhemîd Haj Derwêş e, û ya dî Partiya Yekîtiya Demokratî ya Kurdî, ku serekê wê hêja Ismaîl Umer e. Van herdu partî ji aliyê gelek Kurdan ve têne bersûckirin, ku ewana siyaseta dewletê di nav gelê Kurd de bi cîh tînin û lew re bo çî gavên dirist di xebatê de ne amade ne. Heta kijan pileyê ev bersûckirin raste, ez nizanîm.

Partiya Yekîtiya Demokratî, ku ji aliyê PKK ve li rojavayê Kurdistanê hatibû avakirin, pişt re Tevgera Rêkeftina Demokratî jê cihê bû, ewa ku serekê wê Kemal Şahîn û hinek endamên wê yê rêberiyê hatine kuştin, ta niha neketine vê danîşgehê, lê wekî dixuye, Tevgera Rêkeftin ne li dij danîşgehê ye û wê piştvanîya wê bike, û ne dûre, ku ew jî di nav de cîhê xwe bigire. Ta çî pileyê (PYD) ya PKK wê ji danîşgehê ve nêz bibe, hîn nexweya ye...

Partiyên ku li derveyê welêt ji sala 2000î ve û ta niha hatîne avakirin, Partî Demokratî Kurdistanî – Sûriye û Partiya Yekîti Kurdistanî – Sûriye, tevî rexneyên xwe li hinek bername, partî û mezinan dikin, hema vê gavê pîroz dikin û diyar dikin, ku ewana wê jê re piştvan bin û rewşa hinder welêt di ber çavan re derbas dikin û dizanin, ku xebata li welatekî wekî Sûriye ne wek xebata li welatên cîhana azad û demokrat e.

Bi vê şêweyê, em dikanin bibêjin, ku ev xebat, gava ji aliyê sîstema Baas ve neyê parçekirin û hilweşandin, wê bibe pêşpileyê giring di xebata sala me ya nû de, li rojavayê Kurdistanê.

Lew re ez dîsa vê kefteleftê ji dil de pîroz dikim, û ji partiyên ku hîn li derveyê danîşgehê mane tika dikim, ku ewana jî cîhê xwe di nav de bigirin, da gelê me û tevgera wî ya ramiyarî hêzdartir bibe û dostên me navnîşaneke hevreyî ya tevgerê li ber xwe bibînin, ne 15 an bêtir.